



KAMBAXA VÊ XERÎBIYÊ

DI FOLKLORA KURDÎ DE STIRANÊN XERÎBIYÊ

**“Eger gava yek mizgîniya delalîkê min
Ji welatê xerîb û gurbetîstanê ji min re bîne
Bila qasidê Qoce Felekê, Hezretî Ezraîl îro werê ruhê min bistîne!”**



Rohat Alakom

ralakom@yahoo.com

Motîfa welatê xerîb (welatê der-
eke, welatê biyanî) çawa di
lîteratura cîhanê de, wisa jî di ya
kurdî de cîhekî taybetî digre. Di ed-
ebiyata kurdî ya nivîskî de, wisa jî
di ya devkî de (folklor) ev babeta
cîhekî fireh digre. Bi taybetî bi se-
dan stranên kurdî hene ku di der-
barê xerîbiyê de hatine gotin û mat-
erîalên dewlemend û rengîn pêşkêşî
me dikin. Heta niha qasî ku ez pê
dizanim tu lêkolînek an jî nivîsek

di derbarê van berheman de ne-
hatiye çêkirin.

Dema ez piçûk bûm diya min
carina ji min re digot: “Filankes
çûye welatê jorê”. Ez piçûk bûm,
min zêde nizanibû, jêr kî der e, jor
kî der e? Min tenê li ezmîn dinêrî,
ezman dihate bîra min. Van gotinên
diya min bi rastî hişê min tevlihev
dikir. Paşê ez fêr bûm ku diya min
îfadeya welatê jorê ji bo welatên
xerîb wek bajarên mezin yên mîna
Îstebol, Îzmir û Enqerê bi kar
aniye. Di van salan de gelek kes ji
gundê me û gundên mayin ji bo ku
debara xwe û aboriya xwe bikin,
diçûne bajarên mezin. Ji bo ku ka-
rekî ji xwe re bibînin, bi mehan li
van deverên xerîb dihêwirîn, çavên
zar û zêçên wan bi mehan, carcar bi
salan li rê diman. Ev kurdên neçar
bi taybetî li Taxa Ataturk ya qezaya
Bornovayê li bajarê Îzmirî berev
dibûn, ew der ji xwe re wek cîwar
hîlbijartibûn, heta îro jî bi sedan
malbatên kurd li wir mane. Paşê ez
derketim hatim Ewrûpayê, piştî ge-



lek salan vê carê diya min dengê xwe hildabû kasetekê, ji min re şandibû. Di beşeke vê kasê de stranek avîtibû ser min, rebenê şîret li min dikir û di cîhekî vê stranê de wiha digot: “Xerîbî pir çetin e, tu ne çek e / Milê xwe têra neke!”. Di devoka dorberê Qersê de ji kincan re çek dibêjin. Dê û bavê min, herdu jî dema ez li xeribiyê bûm, wefat kirin. Piştî salekê şunda ez bihîst ku bavê min miriye û ez negihîştim cenazê diya xwe jî. Di wan salan de min nikaribû ez seferî welat bikim, xirûcir, şer û zilm hebû. Bi salan me hev nedîtibû, bendên me ji hev qetiyabûn an jî hêzên resmî yên dewletê dabûn qetandinê. Riya min jî wek gelek penaberên kurd di van salan de li xeribiyê ketibû.

Xerîbî, gurbet, dûrî û dîrwelatî di stranên kurdî yên kevn de temayeke bingehîn pêk tînin. Kesên hatine sirgûnkirin, bi salan leşkerî kirine, ji bo kar çûne deverên din û wek penaber (miltecî) li welatên dereke mane, ji yên mayî re her tim bûne êş û keder. Her du alî jî li benda hev mane. Koçerî, koçberî û koçemalî bûye perçekî jîyana kurdan. Bi dil an jî bi zorê kurdan gelek caran war guhartine. Kurd her tim bûne koçber, penaber û ketine li ser rê û dirban (homo migrantus). Ev yeka serpêhatiya Ahaverus, cihûyê ku hatiye cezakirin wekî heta mirinê rêwî û koçber bibe, tîne bîra mirovan.

Ez dixwazim vê nivîsa xwe dîsa bi vê gotina kurdî ya hînkar û

rênîşandar berdewam bikim: “Xerîbî pir zor e!”. Li xeribiyê per û baskên mirovan dişkên, dest û pêyên mirovan bi qeyd û zincîrkirî ne, îfbar û rûmetan mirovan kêmbibe. Rutbeyên mirovan yek bi yek li xeribiyê tîn jêkirin (degradation). Xewnên şevan li mirovan heram dibin. Qaydekî xeribiyê heye: li xeribiyê mirov her winda dike! Li welatekî xerîb mirov nikare wek li welatê xwe wisa serbest bibe, xwe rehet hîs bike, bilive û tevbigerê. Çawa di stranekê de tê gotin dema mirov ji dost û nasên xwe bi dîr dikeve, mirov li xeribiyê “bêqedir û bêrûmet” dibe.

Eger xeribî gelek dirêj bajo, wê demê rîsk heye ku mirov her du walatan jî winda bike. Bi taybetî kesên ku diçin welatên xerîb wek welatên Ewrûpayê, xerîbî gelek caran ji bo wan dibe seferê bêvegê! Bilêta vegeerê nayê veqetandin! Eger bê veqetandin jî ev bilêta bi salan û hin caran jî heta mirinê di berîka mirovan de (cêv) dimîne. Ji ber ku roja vegeerê li li sirgûnê her tim tê dirêj kirin.

Peyva sirgûn ji kî derê hatiye ketiye zimanê kurdî ez nizanim. Lê belê ev peyva li derdorê Şirnexê wek sergûm tê bi kar anîn û –gûm tê menaya windabûnê. Kurdên Sovyeta kevn digotin cîsîhitî (-bûn, -kirin). Di kurdî de hin peyvên jî hene ku li cihê sirgûnê tîn bi ar anîn, wek nefî (-bûn, -kirin). Hin peyvên erebî ku koçberiya kurdan nîşan didin pir caran di nivîsên kurdî de derbas dibin wek peyvên



mihacir, mihacirî, mihacirtî, mişextî, mişextî bûn, nefî, nefîbûn, nefîkiri...

Di van bîst salên dawî de, gelek kurd, bi sed hezeran derketin der-vayî welat, xwe avîtin ber bextê welatên biyanî û li van deran star bûn, hêwirîn. Piraniya wan, milte-ciyên polîtîk bûn. Di cîhê peyva miltecî, di destpêkê de peyveke mayin tune bû, hin kesan di nivîsên xwe de wek mîsal peyvên revok û tengezar bi kar anîn. Lê belê, van peyvan, di zimanê kurdî de zêde cîh negirtin. Di hin çavkaniyan de peyvên cîhil û derwar hatin bi kar anîn. Di dawiyê de çawa em dibînin peyva penaber zêdetir hate peyvîn û nivîsîn, wek îfadeya penaberên polîtîk. Ew kesên ku koçberî welatên xerîb bûn û xwe avîtin ber bextê van dewlatan, bi dirêjaya salan li wir man. Li van welatên Ewrûpî çend peyvên latînî yên mayin ketin nav zimanê kurdî li welatên dereke wek peyvên deportation (sîrgûn), migration (koçberî), diaspora (belavbûn), exil (xerîbî), getto (taxa xerîban), asyl, asylum, azyl (starbûn)... Serpêhatî, macera, enînivîs û dîroka kurdan hertim ferhenga xerîbîyê “dewlemend” kiriye. Çawa tê xuyan babetê koçberî, sîrgûn û xerîbîyê di zimanê kurdî de wek babetê bal-kêş e.

Di zimanê çîrokî de, mirovan berê xwe dane oxirê, piştê xwe dane felekê, berî beristan, çol çolistan, terkiserî (terkeselatî) dinê bûne, çûne derdiketine welatê hat-

nehatê, çû-nehatê û gelek caran derbeder, serserî û perîşan bûne. Di zimanê kurdî de, îfadeya çolê ketin heye wek mîsal çawa dibêjin: “kurê kerê çolê ketiye!” ango tê maneya ku mirov ji war û cîhê xwe dûr ketiye, hişê xwe winda kiriye, dîn bûye û bûye mecnûn. Ev yeka destana Leyla û Mecnûn tîne bîra mirovan. Dema mîrxasê destanê, Mecnûn li pey rêça jinxas Leylayê dikeve, di dawiyê de delî û dîvane dibe. Di stranên xerîbîyê de jî ev derbederî heye. Di esasê xwe de, dema mirov hemû stranên xerîbîyê baş analîz dike, mirov dibîne ku di bingehe van stranên de tirseke veşartî heye, ew jî “tîrsa windakirinê” ye. Ev tîrsa, tirseke mezin e, dikare wek mirovên çolê ketine û mecnûn bûne wisa mirovan zêdetir biêşîne û nexwaş bike. Warguhaziyê, derwarî û koçberiyê li ser mirovan her tim bandûreke nebaş û neçê hîştîye. Mirov vê yekê di stranên xerîbîyê de gelek bi eşkere û baş dibîne.

Di hemû stranên xerîbîyê de tê dîyar kirin ku xerîbî wek rewşek an jî bûyerekê tiştê nebaş e. Xerîbî qeza, bela û felaketeke mezin e ku tê serê mirovan û nikare bê tarîfkirin, ewqas dijwar e. Di kurdî de ev yeka wiha tê zimîn: “Xerîbî pir zor e” û hin caran jî “xerîbî ne tu kar e” tê gotin:

**Xerîbî ne tu kar e,
Forma rojê: bi hesavê, bi defterî,
bi jimare,**



**Wextê xerîbê xelqê xerîbîyê tîn,
Xerîbê me xerîbîyê de dimînin
Mînanî kulekeke pey keriyane.**

Çawa di vê stranê de jî tê xuyan dema xerîbîyê de wext dirêj dibe, wext nayê kişandin. Çav her tim li rê ne. Şewata bêrîkirinê angorî pîvanên wek dûriyê û hezkirinê tê guhartin. Tecrûbeyên kurdan yên bi sedsalan nîşan daye ku xerîbî bi êş, bi jan û bi keder e.

Dema du kesên ku ewqas zêde hev hez dikin, ji hev dûr dikevin û ji hev diqetin halê xerîbîyê peyda dibe. Êş, jan û kedereke mezin him li bal yê çûyî û yê mayî peyda dibe.

Gelo çima xerîbîyê ewqas bi hunerî û bi artistî di stranên kurdî de cîh girtiye? Bi baweriya min yê mayî û yê çûyî bi saya van stranan ve bi hev re dipeyîvin, dikevin têkiliya û didin-distînin. Hêvîkirin, hesret, bêrîkirin di van stranan de bi şewat ji nû ve tîn tarîfkirin û efirandin.

Mirov xwe dinya çîrokan de dibîne, wek li welatê hat-nehatê. Carina çûyîn heye, lê belê hatin tune ye. Tecrûbeyên kurdan yên sedsalan ev yeka baş nîşan dane. Gelek kes li xerîbîyê nexwaş ketine, di şeran de mirine, qezayek hatiye serê wan û li wan welatên xerîb mirine. Ev xeberan reş gelek caran bûne babetên stranên xerîbîyê û hin caran jî nêzîkî stranên şîne dibin. Ji ber ku destên dildar, dilketî û hezkiriyên di mercên xerîbîyê de nikarin bighijin hev, ew dûrîdest in, bi gotineke din ew bi

dest nakevin. Di zimanê kurdî de tu peyv qasî peyva dûrîdest maceraya dildaran û hezkiriyên li xerîbîyê nikare tarîf bike û bîne zimîn. Peyva dûrîdest bi rastî peyveke gelek şîrîn, romantîk, kurt û manekûr e.

Di folklorê kurdî de stranên xerîbîyê zêdetir ji bo kesên ku sirgûn bûne hatine gotin. Sirgûnî wek bûyereke gelek bi zehmet hatiye dîtin. Bi zorê ve mirov ji erdê kal û bavên xwe hatine qetandin û dewletê ew şandine cîhên nenas û dûr. Li jêr di strana Bavê Hamê de kesê/kesa mayî bi kesên sirgûnbûyî re dipeyîve, ketiye têkiliyan û bi cûreyekî artistî, bi hunerî dide-distîne:

Bavê Hamê

**De lo-lo, lo-lo, lo-lo, lo-lo, lo-lo,
lo-lo, lo-lo,**

**Ezê çûme mala bavê Hamê,
weyla min dêranê,**

Bavê Hamê ne bi male,

**Dibê, milê bavê Hamê girtibûn,
şandibûn kela Stenbolê, nizanîm
çimaye?**

...

**Kulê tu têkevî mala Roma
xayîn,**

**Destê kekê Hemo girtin bêsuc û
bêgune,**

**Bi mixenetî dane kambaxa vê
sirgûnê,**

Çawa kesek xweyê xêrê tune

**Cabekê xêrê ji kekê Hemo, apê
Gulîzarê ji min re bîne?**

Ez nemînim, ez nemînim,

**Paşî kekê Hemo, apê Gulîzarê, li
dinyayê sax nemînim.**



Di salên seferberiyê û revê de dema kurdên dorberê Serhedê, wek Qersê, Agirî û Wanê derbasî Sovyeta kevn dibin, hin nas û pizmamên wan li aliyê mayin yê sînor dimînin. Di salên şer de gelek kurdên êzîdî derbasî aliyê Ermenîstan û Gurcistanê dibin. Vê koçberiya kurdan ya ne bi dil gelek malbatên kurd û neferên wan ji hev veqetandin. Peyva rev û bez di zimanê kurdî de cîh girtiye. Him ew kesên mayî û him jî yên ji sînor derbas bûne, çûne li aliyê Sovyetê bi salan bi hesreta hev mane. Di salên 1930yê de, ermenîkî kal, bi navê Arakel Eloyan ji bo hesreta welatê xwe derbasî aliyê Tirkîyê dibe û dixwaze erdên kal û bavê xwe zîyaret bike. Lê belê, çawa di pirtûkê de jî tê xuyan ev gera wî wisa bi hêsa derbas nebûye. Di edebiyata kurdî ya Sovyeta kevn de mirov carina rastî van nimûneyên berhemên xerîbiyê tê. Ew strana navdar ku bi salan li ser zar-zimanê şênîyê Serhedê geriyaye: "Weylê dîne çiya bilind in te nabînim!" yek ji wan stranên here hezkirî dikare bê hesibîn. Ew cihên sirgûnê di stranên kurdî wek cihên wêran, kavil, xopan, dêran û kambax tîn tarîfkirin, wek cihên xerabe û xirbe hatine bi navkirin. Di vê strana jêrîn de malbateke ku ji Serhedê, ji zozanên Serhedê sirgûnî deşt û germistana Dîyarbekirê bûye, gazin û loma li vî meskenê teze dike û xerîbiyê dikşîne:

**Welatê Serhedê li sînorê vê
Îranê,
Îsal ji pêra koçerî çawa şunda
ketin ji zozanê,
Xaliqo, tu serê sebaba dewletê**

**re qebûl nekî,
Çawa destê me ji cî û warê me
qetandin,
Berê hêsîrê me dane welatê
Dîyarbekir,
Na welle, deşta Bişêriyê, germe,
germistan e?
Bavo, welatê me nîne
Welat, welatê xerîb e,
Delîla welatê Serhedê.**

Ji aliyê din Dîyarbekir ji bo kesên ku zaroktî û xortaniya wan li wir derbas bûne, her çiqas zêde germ be jî, bêgûman bajarekî gelek şîrîn e wek stranek çawa dibêje: "Dîyarbekir mala min e!". Ev danasîna gelek girîng e. Dema mirov xwe di mala xwe de dihesibîne, li bal nas, heval û hogirên xwe ye, wê demê xerîbiyê nakşîne. Mirov, evînê, hezkirin û kêfxwaşiyê di van xetan de baş dibîne: "Dîyarbekir mala min e!".

Çawa tê zanîn, îro bi sed hezaran kurd li welatên Ewrûpayê dijîn, li welatên xerîb û biyanî kar dikin. Di stranên dûrî û xerîbiyê de gazin û lomeyên mezin li van welatan tîn kirin. Ji Anatoliya Navîn wek mîsal bi hezaran kes îro li Ewrûpayê dimînin. Di destpêka vê koçberiyê de tenê mêr diçûn, jin li van gundan tenê bi serê xwe diman, hejmara mêran yek-ten kêm dibûn: "Qurbana we me werin carekê mehla me bigerin / Welle ji jinan bêtir mêr têda neman!" Dema gelek kes bar dikin û koçberî welatên biyanî dikin, cihên kal û bavên wan xalî dibin, kes li van deran êdî namîne û kilîtan deriyên xwe dixin, terkiserî dinê dibin. Yek ji wan



dengbêjên kurdên Anatoliya Navîn bi navê Remziyê Kurd (Kurt Remzî) vê koçberiyê wek “çerx bûm geryam li vê dinyê” dinavîne û van seferan wek destpêka tunebûnê dihesibîne. Di van stranan de her tim xerîbî, mirin û şîm heye:

**Çerx bûm geryam li vê dinyê
Biryâ te kir xewên min nê
Lêlê çavên te nabînim
şuna girî xwîna reş tê.
Sirum sirum sirmûş dibim
Ro bi ro tewa dibim
Hawar derdê min çî giran e
Dost digrîn dijmin şa dibin**

**Vê qûrbetê omrê min bir
Hesretê ceger li min qûl kir
Ez li ber mala xwe digirim
Te hustiyê min bukmîş kir.**

Di van stranan de jan, êş û kedereke wisa mezin heye ku êdî “bese!” tê gotin. Çavên wan bi salan rê de mane û êdî sebir nemaye. Di vê strana ji derdorê Mereşê de jî baş tê xuyan ku dûrî û xerîbî êdî nayê kişandin.

**Anê halê me va ye, etê halê me
va ye
Tu sebra min nemaye
De bese keko bese, de bese
xwangê bese
Çavê me yî li rê maye
De bese zalim bese, çavkê me yî
li rê maye
De were keko were, de were
dostê were
Bîrîna min pir xetar e**

**Li gurbetiyê bi tenê ustî min
xwa re...**

Leşkeriya salên berê bi salan ajotiye. Di van salan de îmkana şandina nameyan, telefon û qanalên ragihandinê yên mayin tune bûne. Her du çavên mirovan her tim li riya mane, rûniştine hêvîya delaliyên malê û torinên malê sekinîne. Vê yekê, li ser mirovan bandûreke nebaş hiştiye. Wek di strana jêrîn de jî xuya dibe rebena jinikê heta mêrê wê ji leşkeriyê hatiye, nîvê (felqek) porê wê spî bûye:

**Gede lawikê min çû
Gede lawkê min çû eskeriyê
derengî bû
Cabeke ne bi xêrî ji min re
hatibû
Divê: Gede lawkê te tevî Roma
îkîncî bû.
Heya gede lawkê min bizvire
bêyo,
Felqek gulîyê min reş bû, yek
spî bû...**

Gelek stranên kurdî yên xerîbiyê di derbarê dilketiyên ku ji hev dûr ketine, hatine gotin. Çavên wan her tim li rê maye, qerimîne. Bi xewn û xewnerojan ve rojên xwe derbas kirine. Di van stranên kurdî de sazîke gelek balkêş heye, dema yek diçe xerîbiyê, divê tiştêkî wek nîşana hezkirinê bihêle, yê mayî kêfa xwe pê bîne wek derman li bal xwe bigerîne. Ev yeka ji bo yê çûyî jî derbas dibe. Di van her du stranên jêrîn de titûn, sêv û şikil wek du



“dermanên xerîbiyê” hatine dîtin:

Zeriyê qurban, ez ê kêfsiz im,
bêmede me
De tu rabe cixarek titûna
Qizilaxaca Muşê ji min re bîne
Dar û darçin, sabûna lewantê
Xudana eniya kever pê bireşîne.
Yek ji me diçe welatê xerîba,
yek dimîne
Bira sebra xwe pê bîne.

Di çend stranên mayîn de jî, em rastî îfada wek "memik derman in" tîn. Bi taybetî kesê ku ji dilketiya xwe dûr dikeve, diçe xerîbistanê, gelek caran bedhal dikeve, ker-gêj dibe. Keçik ji ber vî derdê dûrketinê, bi stran be jî, diçe hawariya wî, di ber dilê wî de tê û dixwaze timê bîna lawikê xwe li xerîbîyê fireh bike:

Dilê min li ser dilê min re kale-
kale,
Îro cabek ji min re hatiye, dibê
lawikê te,
Li welatê xerîbiyê nexwase, pir
bedhal e.
Li welatê xerîbiyê ne balgî ye,
ne doşek, ne perpale,
Ezê îznê ji dê bavê xwe
bixwazim,
Herim welatê xerîb, xwe jê re
bikim balgî,
Sîngê xwe bikim perpale,
Bila lawkê min bi kêf be, êdî
menale...

Di stranên xerîbiyê de şadî, dilşahî û kêfxwaşiya here mezin bêguman, mizginîya hatina hez-

kiriyan e.

Min sonda mezin xwariye
Heçî saloxekî ji delalî malê ji
min re bîne
Ezê bidim heft aşê mala bavê
xwe rebenê
Li ber çemê Nisêbînê.

Dema yek mizginiya hatinê ji yê mayî re bîne, yê mayî amade ye ku her tiştê xwe! pêşkêş bike ji bo wê xebera xwaş. Ew kes amade ye canê xwe jî bide!

Eger gava yek mizginîya
de lalîkê min
Ji welatê xerîb û gurbetîstanê ji
min re bîne
Bila qasidê Qoce Felekê,
Hezretî Ezraîl îro werê ruhê min
bistîne.

Welatên dereke û biyanî her çiqas xwaş dibin bila bibin jî, çawa di stranên kurdî yên xerîbiyê de jî tê xuyan, welatê mirovan li ber dilê hemwelatîyên xwe her tim şirîntir e. Mirov li welatê xerîb her tim bêhiş, bêmade û melûl e. Mirovên ku diçine xerîbiyê, wek qulingên ku ji refên xwe diqetin, wek wan bi serê xwe tenê bêgav û bêçare dimînin. Dengbêjê kurd, Evdalê Zeynikê ku pisporê qulingan û xeribiyê bûye û bi wan re peyivîye, wiha dibêje: “...Quling hertim cot-cot in û ew hertim bi hevra diqîngînin. Qîrîna qulingekî bi serê xwe tenê elametê xêrê nîne, yeqîn tişteke hatiye serê wî”. Mirov jî wisa ye, dema ji koma xwe, refên xwe û berdilkên xwe diqete her tim ker û gêj e:

**Heyla dilo, tu bi şevê-royê
diqîrî, çima qe nawestî
Mînanî qulingê Serhedê ji refên
xwe qetyayî
Serê baskê te bi çamûr, koka
baskê te şkestî
Ezê îro dikim herim zozanê
mala bavê muhuba xwe,
Gelî gundîno ez nezan im,
ez xerîb im
Nizanim zozanê mala delaliya
min maye li kîjan alî, kîjan
destî...**

Motîva qulingan û refên qulingan di strana Lo, lo lawko de, babeta çêkirina hêlînan li xerîbiyê tîne bîra mirovan:

**Lo, lo lawiko
Ezê teyr im, teyrê ser payîzê
Minê hêlîna xwe çêkiriye
Welatê xerîba, li vê dûzê.**

Dema yek ji xerîbyê tê, kurd wan wek teyrê xerîb dihesibînin û bi germî wan hembêz dikin: “Teyrê xerîb tu ser seran, ser çavan, bi xêr û bi silamet hatî!”. Hatine kesekî an jî kesekê wek dilşahîke mezin li her derê zû belav dibe. Çawa di gelek stranên kurdî jî de derbas dibe, stranbêjan gelek caran xwe wek “Xerîbê Xwedê” û “Xwerîba Xwedê” dîtine. Ev yeka tê çi maneyê?

Ez bawer dikim ku di van berhemen folklorîk de stranbêj bêgav û bêçare ye û nizane çî bike, wek mekanîzmake xweparastinê, vê carê xwe spartiya Xwedê û xwastiye bibe parçekî mezinhaya Xwedê. Motîva tenêmayînê, dûrî û xerîbiyê di van stranên de ketine zikê hev, bêgavî û bêçaretîkê îfade dikin.

Mirov here kî derê bila here dîsa li welatê xwe vedigere û welatê xwe difikire, wek kulîlka berbiro ya ku divê rûyê xwe ter tim li berbi rojê bizvirîne ya ku bê roj nikare bijî. Eger ew, rojê nebînin diçilmisin wek dilên şkesî li xerîbiyê. Tu tiştek qasî kulîlka berbiro nikare hesreta welêt bîne zimîn. Mirov jî wisa ye, her tim rûyê xwe digurîne ber bi welatê xwe wek kulîlka berbiro (Heliantus - latini, sunflower-îngîlîzî). Kurdên ku li welatên xerîb dimînin, wek kulîlkên berbiro hişê wan hertim li ser welêt e. Xerîbî wek şêrîteke filman li ber çavên wan tê-diçe. Belê, ev e serpêhatiya xerîbiyê, kurdên koçber, refên qulingan, çêkirina hêlînan û kulîlkên berbiro.

**Emê çî bikin xwe vî dilê şkestî,
Emê gula biçînin, dêkine destî,
Sibê herkesekê ser mezêlê xwe
bela ke,
Gelo mezêlên xerîba maye li kî**

